KOMELEYA NIVÎSKARÊN KURD
KÜRT YAZARLAR DERNEĞİ
KURDISH WRITERS' ASSOCIATION
2004

Ji bîr û raya gişti re

Ji PEN'a navneteweyî, PEN'a Kurd, PEN'a Tirk, Sendîkaya Nivîskarên Tirk, Sendîkaya Rojnamevanên Kurd, Yekîtiya Nivîkarên Kurd a Duhok, a Hewlêr, a Kerkûk, a Silêmaniyê re;

Yek ji erkên dewletên dinyaya pêşketî li kîjan erdnîgariyê dibe bila bibe, parastina ziman û çandên cuda, ayînên cûda, nêrîn û bîr û baweriyên cuda ye.

Weke dewlet Komara Tirkiyeyê li ser hîmê yek ziman, yek neteweyî xwe ava kiribe û damezrandibe jî, ev xweserî mafê tûnekirin, qirkirin û jiholêrakirina ziman, çand û ayînên di nava sînorên Tirkiyeyê de nade hikumetan û her wiha tu dezgehên dewletî.

Ji gelê Kurd pê ve kîjan gel di serdema îroyîn de ji hemû xweseriyên xwe yên mirovî, civakî neteweyî bêpar e li ser rûyê gerdûnê? Di nava civaka mirovahiyê de, gelin hene ku rêjeya wan bi qasî ya navçeyeke kurdan nayê; li pêş Neteweyên Yekbûyî serxwebûna xwe dadixuyunin, ala xwe ya neteweyî hil didin. Gelê Kurd jî divê weke her mirovî, her civakê, her neteweyî xwediyê çarenûsa xwe be.

Di pêvajoyeke ku gelê Kurd, hûr û gir, jin û zarok, naşî û ciwan li qadên xwepêşandanan dirûşmên ***'Em perwerdeyê bi zimanê xwe dixwazin'*** berz dikin de, dadgehên ku timsalên heq û hiqûq û dadê ne, bi hinceta ku nivîskarekî kurd di mîtîngê de axaftin kiriye, bi cezeya hepsê tewqîf bike; li wî welatî, mafê axaftinê nîn e, mafê xwederbirînê nîn e, mafê mirovan nîn e!

Hemîd Dilbihar Endamê Komeleya Nivîskarên Kurd e û weke nivîskarekî dê bîrdozekê biparêze. Ev ji mafê wî ye, wekî her însanî ew jî dikare fikrek, ramanek biparêze. Ev nabe sûc, ev mafê bingehîn yê kesayetî û azadiya ramanê ye.

Ji vê boneyê, Komeleya Nivîskarên Kurd bangî rayedar û rêveberên dewletê dike, ku di zûtirîn katê de endamê me hozanvan û nivîskar Hemîd Dilbihar ji zindanê berde, û pê re jî ji nivîskêr, ji raya gişti û ji xwediyên vî zimanî lêborîna xwe bixwaze!

20/09/2008/Amed
Komeleya Nivîskarên Kurd

Navnîşan: Gevran Caddesi 1. Akkoyunlu Sk. Kupik 9 Apt. Kat: 1 No: 2 Ofis**/Diyarbakır**
WEB: www.kurtyazarlardernegi.org.tr
Tlf-Fax: 0090 0412 224 33 12
GSM: 0090 533 655 69 83
E-Mail: komeleyaniviskaran@yahoo.com
komeleyaniviskaran@hotmail.com
a_irba@yahoo.com